THE KURDISH CENTER FOR STUDIES

Yekîneya Lêkolînên Îranî

# Şerê amerîkayî-îsraîlî yê li dij rêjîma Îranê

Sedem, rêbaz û helwestên hêzên Rojhilatê Kurdistanê



The Kurdish Center for Studies

## Derbarê NKLyê

Navenda Kurdî ya Lêkolînan (NKL) saziyeke serbixwe û ne ji bo qezencê ye ku di sala 2014an de hatiye damezrandin û taybet bi karûbarên siyaseta herêmî û navdewletî ye. Armanca NKLyê di hemû çalakiyên wê de ew e ku zanebûn, aşitî û hevjiyanê bi pêş bixe, di serî de jî xurtkirina diyalogê di navbera gelê Sûriyayê de.

Piştî çend mehên bilindbûna fişarên leşkerî û siyasî ji aliyê Amerîka û Îsraîlê li dij rêjîma Îranê, herdu dewletan di 28ê Sibata 2026an de êrîşeke hevdem û ji nişka ve pêk anîn, ku armancên leşkerî û cihên stratejîk li paytexta Tehranê û gelek bajar û herêmên din hedef girtin.

Di heman demê de, civîneke rêveberiya Îranê jî hat hedefgirtin, ku di encamê de gelek kesayetiyên leşkerî, siyasî û olî hatin kuştin, di nav wan de jî rêberê bilind ê şoreşa Îranê Elî Xamineyî.

Serokê Amerîkayê Donald Trump piştî çend saetan ji êrîşê daxuyaniyek da, ku tê de bang li rêjîma Tehranê kir ku dev ji bernameya nukleerî berde, herwiha bang li gelê Îranê kir ku vê derfetê bikar bînin ji bo hilweşandina rêjîmê.

Îranê jî bi rêzeêrîşên mûşekên balîstîk û dronan bersiv da, ku bajarên Îsraîlê, baregehên Amerîkayê, cihên aborî û navendên enerjîyê li welatên Kendavê, herwiha li Urdun, Qubris û Herêma Kurdistanê hedef girtin. Herwiha, Tengava Hurmuzê hat girtin û rê li ber keştiyên bazirganî hat girtin.

Bi vê gavê re, rêveberîya Îranê hewl da ku qada şerê berfireh bike û rûbirûbûnê mezin bike, bi armanca afirandina aloziyeke herêmî û cîhanî, bi zirardana aborîya cîhanî bi rêya qutkirina petrolê.

Armanca sereke ew bû ku eniyeke berfireh a cîhanî li dij êrîşa Amerîka û Îsraîl li dij rêjîma Tehranê, ava bike.

Di vê lêkolînê de, şerê ku ji aliyê Washington û Til Ebîbê ve li dij rêjîma Îranê ku 40 rojî dewam kir (ji 28ê Sibata heta 9ê Nîsana 2026an) û hemû bûyer û guhartinên mezin ên ku çêbûne, wê werin nirxandin.

Herwiha, em ê hewl bidin ku wate û encamên vê şerê were fêmkirin, çi li ser rêjîma Îranê û çi jî li ser herêm û cîhanê bi giştî.

Di heman demê de, pêşketinên rojane û hemû îhtîmalên vekirî em ê bînin ziman, nexasim ku danûstandinên di navbera Washington û Tehranê de bi serpereştîya Pakistanê hîn jî dewam dikin, lê heta dema amadekirina vê lêkolînê tu encamên berbiçav nehatîye bidestxistin.

Ji aliyekî din ve ‹her aliyek li ser daxwaz û şertên xwe sekinî ye ‹piştî ku her yek ragihandiye ku ew ji şerê bi serkeftî derketiye.

Ji ber vê yekê ‹her aliyek dihewîne ku aliyê din senaryoyên çareserî û lihevhatinê yên ku ew bi xwe rast û guncav dibîne ‹qebûl bike.

### Yekemîn: Sedemên êrîşê

Piştî êrîşên berfireh ên Îsraîlê di hezîrana 2025an de li dij Îranê, ku bi êrîşên Amerîkayê li ser navendên nukleerî yên Îranê bi dawî bûn, Washington û rêveberiya serok Donald Trump dest bi kirina fişarê kirin ji bo çareseriyeke siyasî, piştî ku Tehranê qebûl kir vegere maseya danûstandinan. Ev çareserî bi şertê ku rêjîma Îranê daxwazên Amerîkayê qebûl bike û dev ji bernameya xwe ya nukleerî berde û hemû madeya yûranîyûma xwe radest bike (ku depoya heyî yê Îranê nêzîkî 440 kîlogram e bi asta 60%). Herwiha, di nav şertan de jî tê xwestin ku bernameya nukleerî bi temamî were hilweşandin.

Di heman demê de, di lîsteya daxwazên Amerîka û Îsraîlê de şertek jî heye ku bernameya mûşekan a Îranê were sînordarkirin, da ku Tehran nikaribe mûşekên balîstîk û bilez yên ku zêdetirî hezar kîlometre diçe û dikarin bigihîjin axa Îsraîlê, çêbike. Bi gotineke din, tê xwestin ku asta gihîştina mûşekan were sînordarkirin ku 500 kîlometre derbas neke.

Herwiha, şertên din jî ev in ku rêjîma Îranê dev ji piştgiriya rêjîm û komên çekdar ên hevalbenêdn xwe li Yemen, Iraq, Lubnan û Xezayê berde. Di heman demê de para mezin a veberhênan, jinûve avakirinê û pêşveçûnê bide şerîketên Amerîkayê. Di berdêla vê yekê de ‹Amerîka dê cezayên aborî li ser Tehranê rake, têkiliyên siyasî û dîplomatîk bi awayekî normal vegerîne û soz bide ku li dij Îranê hêz neyê bikaranîn, wekî ku çawa di hezîrana 2025an de Îsraîlê ji nişka ve êrîş kir . Di wî şerê 12 rojan de,  beşek mezin ji şiyanên leşkerî yên Îranê hatin rûxandin û gelek generalên asta yekem û zanyarên girîng di bernameya nukleerî de hatin kuştin(1).

------------------------------

(1) ـ أنظر: طارق حمو: "تغيير الخرائط".. مشروع إسرائيلي يربك حسابات تركيا وإيران. المركز الكردي للدراسات. تاريخ النشر في 27 يوليو/ تموز 2025. الرابط:

14003/https://nlka.net/archives

Herwiha ‹Amerîka bi rêya vî şerê -bi beşdariya Îsraîlê -armancên wê yên cuda hene, ji wan"Lawazkirina bingeha rêjîmê û afirandina şertûmercên navxweyî yên guncav ku rê li ber hilweşandina wê vekin.

Ev yek eger ku êrîşa hewayî nikaribe rêjîma Îranê bi dare zorê xwe radest bike û şertên Amerîka û Îsraîlê yên girêdayî bernameya nukleerî, bernameya mûşekên balîstîk û hevalbendên herêmî, qebûl bike.

Dîyar e ku heta asteke mezin, di navbera Amerîka û Îsraîlê de li ser armancên vê şerê hevahengiyek heye, çi di warê têkbirina bernameya nukleerî ya Îranê de, çi jî di rûxandina rêjîmê de, an jî di sînordarkirina şiyanên leşkerî yên mûşekî de.

Herwiha, ev armanc pêşbînîkirina siberojê jî dihewîne, nexasim di warê jinûve çêkirina hevsengiyên hêzê di Rojhilata Navîn de(2).

Di çarçoveya amadekariyên ji bo şer de, Amerîka hêzên xwe veguhastin herêma Kendava Erebî û Deryaya Omanê û bi hefteyan komkirina hêzan domand, ji bo ku eger Îran daxwazên Washingtonê qebûl neke, êrîşên leşkerî li dij wê pêk bîne. Di heman demê de, hevahengiya îsraîlî-amerîkî li ser asteke bilind hate çêkirin û  cihên ku werin hedefgirtin û hilweşandin, hatin dîyarkirin.

Berî vê yekê, ji ber bilindbûna nirxan, lawazîya debara jiyanê û rûxandina nirxê diravê neteweyî, di kanûna 2025an de, li Îranê xwepêşandanên mezin û berfireh rû dan, ku destpêkê li Tehranê bû û piştre belavî hemû herêmên welêt bûn. Xwepêşandaran dirûşmeyên siyasî bilind kirin,  ku tê de daxwaza guhartina rêjîmê û hesabpirsîna berpirsan kirin. Lê desthilatdariya Îranê bi tundî bersiv da û bi hezaran kes girtin.

Herwiha, agahî belav bûn ku bi hezaran xwepêşandar hatin kuştin û saziyên ewlekariyê bi sedan xwepêşandar, çalakvanên siyasî û parêzvanên mafên mirovan darve kirin.

Serokê Amerîkayê Donald Trump jî ev derfetê bikar anî û bang li gelê Îranê kir ku rabin serhildanê û dest deyînin li ser sazî û dezgehên dewletê û soz da ku alîkariya Amerîkayê "Di rê de ye".

Lê piştre, Trump paşde çû  û îdîa kir ku desthilatdariya Îranê soz daye ku darvekirina 800 kesan rawestîne yên ku bi bihaneya beşdarbûna di xwepêşandanan de hatibûn girtin(3).

Dema ku gerên nû yên danûstandinan di navbera Washington û Tehranê de li ser dosyayên mayî hatin destpêkirin, hêvî zêde bûn ku çareseriyeke siyasî bi Îranê re were dîtin. Lê "analîzvan û çavdêrên siyasî dibêjin ku aramî û rawestana helwesta Amerîkayê ne ji ber nermbûna Îranê ye, lê ji ber sedemên lojîstîkî ye. Ji wan sedeman ew e ku amadekariyên leşkerî yên Amerîkayê ji bo êrîşeke mezin li dij Îranê hîn temam nebûbûn.

Herwiha, Îsraîl ji Washingtonê daxwaz kir ku hinekî bisekine, heta amadekariyên xwe ji bo rûbirûbûna bi Îranê re bi temam bike.

Ji aliyekî din ve jî, hin dewletên erebî yên Kendavê û Tirkiyayê fişar kirin da ku şer neyê destpêkirin û derfetekê ji bo dîplomasiyê were dayîn. Ev yek bû sedem ku danûstandinên ku piştî şerê 12 rojan di hezîrana borî de hatibûn rawestandîn, careke din bidomin.

Di heman demê de, hin kesan bawer dikin ku ev danûstandin tenê şanoyek bû ku ji aliyê Trump ve hate rêxistinkirin, da ku demê bi dest bixe û amadekariyên şer temam bike. Lê eger Îran hemû daxwazên Amerîkayê qebûl bikira, dibe ku armanc û encamên şerê ku hatibû plan kirin, bê şer jî pêk bihata(4).

Trump mehek da Îranê da ku hemû şertên Amerîkayê qebûl bike, ji bo ku xwe şerekî mezin ku Washington bi hevkariya Îsraîlê amade dike, dûr bikeve. Di demekê de ku danûstandinan dihatin lidarxistin, Amerîka hêzên xwe yên leşkerî bir herêma Kendava Erebî, di nav de keştiyên şer û keştiyên balafirhilgir jî hebûn.

Gera yekem a danûstandinan li paytexta Omanê, Musqatê, di 6ê Sibata 2026an de hate lidarxistin. Cudabûna nêrînên Washington û Tehranê di vê gerê de çêbû. Amerîka israr dikir ku dosyaya nukleerî ya Îranê bi tevahî were girtin, radestkirina yûranûma pêşketî, hilweşandina amûrên santrifujan, sînordarkirina bernameya mûşekan, di nav de mûşekên balîstî û deng-zêde, û qutkirina têkiliyên Îranê bi hevalbendên wê yên herêmî re.

Di aliyê din de, Tehranê israr dikir ku danûstandin tenê li ser dosyaya nukleerî be û mafê xwe yê hilberandina yûranûm bi rêjeyên diyarkirî ji bo armancên aşîtî biparêze.

Li ser vê bingehê jî, ev gera danûstandinê tu encam bi dest nexist û gerên nû yên danûstandinan li Cinêvê di 17 û 26ê sibatê 2026an de hatin lidarxistin.

Cudabûna nêrînan di navbera Îran û Amerîkayê de pir mezin bû. Washington di destpêkê de qebûl kir ku danûstandin tenê li ser bernameya nukleerî ya Îranê be û piştre dosyayên din ên wekî bernameya mûşekan û têkiliyên Tehranê bi hevalbendên herêmî re werin nîqaşkirin. Lê nakokî zêde bû û valahî di navbera her du aliyan de pir bû.

Washington israr dikir ku hemû yûranûmya çêkirî ya Îranê ya bi rêjeya ji sedî 60 ji welêt derkeve. Di heman demê de Tehran pêşniyar kir ku rêjeya çêkirina yûranûmê kêm bike di bin çavdêriya Ajansa Navneteweyî ya Enerjiya Atomî (IAEA) de, beramberî rakirina cezayên aborî.

Hêviyeke nerm derket holê piştî daxuyaniya Wezîrê Karê Derve yê Omanê Bedr El-Bûsîdî, ku ragihand Tehran razî bûye ku yûranûmê derxîne derve û navendên nukleerî bikevin bin çavdêriya tîmên IAEA. Lê di 28ê sibata 2026an de, şer destpê kir dema ku Amerîka û Îsraîl êrîşeke hewayî ya hevaheng û jinişkeve pêk anîn û civîna rêberê bilind Elî Xamineyî hedef girtin.

Di encamê de, Xamineyî û hejmareke mezin ji rayedarên leşkerî û siyasî yên rêjîmê hatin kuştin. Bi vî awayî pêvajoya danûstandinan qediya û pêvajoya şer bi hemû guhartin û pêşketinên xwe dest pê kir(5).

Îhtimaleke zêde heye ku danûstandin tenê ji bo qezeckirina demê bûn, da ku amadekariyên şer bi temamî werin bidawîkirin, eger Îran şertûmercên amerîkî qebûl nekirin. Agahiyên heye ku Washington û Tel Ebîb plan dikirin êrîşê beriya hefteyekê ji dema pêkanîna wê bikin, lê operasyon ji ber sedemên teknîkî û îstixbaratî hate paşxistin.

Ev paşxistin derfet da Donald Trump ku hefteyek din jî bi awayekî dîplomatîk nîşan bide ku hemû derfet hatine bikaranîn beriya destpêkirina êrîşê. Nexasim piştî bidawîbûna gera duyemîn a danûstandinên amerîkî–îranî di 17ê sibatê de, ku bê encam qediya. Di vê demê de, plangirên leşkerî yên amerîkî û îsraîlî amade bûn ku êrîş di 21ê sibatê de pêk bînin, lê erêkirina dawî hefteyek din dereng ket ji ber şert û mercên hewayî yên nebaş li herêmê, ku pêkanîna operasyonê asteng kir.

Her çend Trump îdîa kir ku biryara êrîşê piştî danûstandinên dawî yên Cinêvê di 26ê sibata 2026an de girtiye û li ser agahiyên îstixbaratî yên ku dibêjin Îran bi veşartî bernameya xwe ya nukleerî ji nû ve destpê kiriye. Lê agahîyên cuda yên

belav bûbûn, nîşan didin ku êrîş bi rêbazeke plankirî bû ku tê de dîplomasî wekî pêvajoyeke berdewam xuya bibe, di demekê de ku amadekariyên leşkerî di qonaxên dawî de bûn(6).

## Duyemîn: Rastî û sedemên êrîşê:

Êrîşa hevbeş a îsraîlî–amerîkî di sibeha 28ê sibata 2026an de pêk hat û civîneke rêveberiya Îranê ku tê de Elî Xamineyî û gelek lîderên payebilind hebûn, hedef girt. Li gorî çavkaniyan, Îsraîlê beriya civînê bi rojekê agahiyê stendibû û ew agahî bi Washingtonê re parve kir. Ji ber vê yekê, operasyon beriya temamkirina amadekariyên leşkerî û beriya domandina jî gerên din ên danûstandinan hat pêşxistin, herwiha beriya nîqaşkirina xalên nakok ên mayî di navbera Washington û Tehranê de.

Amerîka navê operasyona xwe li dij Îranê kir "Hêrsa Destanî"(Epic Fury) û Îsraîl jî navê operasyonê kir "Gurrîna Şêr"(Roaring Lion). Serokê Amerîkayê Donald Trump çar armancên sereke yên hemleyê di daxuyaniya xwe de li ser platforma “Truth Social” diyar kirin: Yekem, rê nedin ku Îranê çekên nukleerî bi dest bixe; duyem, rûxandina bernameya mûşekan û navendên hilberîna wan; sêyem, hedefgirtina hêz û hevalbendên Îranê li herêmê û çarem, tunekirin  hêza deryayî ya Îranê.

Paşê Trump ragihand ku êrîş ji bo pêşîgirtina li "metirsiyek li ser Amerîka û berjewendiyên wê yên ewlekariya neteweyî"hatiye kirin û îdîa kir ku Îran hemû derfetên devberdana ji bernameya xwe ya nukleerî red kirine û Amerîka êdî nikare ev rewşê tehemûl bike(7).

Îran û hevalbendên wê di nav herêmê de bi mûşek û dronan bersiv da êrîşa hevbeş a îsraîlî–amerîkî û bajarên Îsraîlê û gelek baregeh û berjewendiyên amerîkî li herêmê hedef girtin. Herwiha, navendên hilberîna petrol û gazê li çend dewletên cîran ên erebî jî hatin hedefgirtin, di nav de Behrên, Qeter, Siûdîyê, Îmarata Erebî ya Yekbûyî û Sultenet Oman.

Îran di roja yekem a êrîşê de derbeyeke giran xwar, ji ber ku êrîşa hevbeş a îsraîlî–amerîkî serikê rêjîmê û sembola wê û gelek serokên payebilind ku bi wî re bûn, kuşt. Di vê rewşê de, li pêş rayedarên Îranê sê armancên sereke derketin:

Yekem, dabînkirina berdewamîya saziyên dewletê û parastina wêneyê rêveberiyê, piştî windakirina serokatiya siyasî ya bilind. Ji ber vê yekê,

desthilatdarî wekî senaryoyekî berê amadekirî tevgeriya. Di vê çarçoveyê de encûmena rêveberiyê ya demkî hat avakirin li gorî madeya 11ê destûrê, ku ji serokên her du hêzên rêveberî û dadwerî û yek endamê Encûmena Parastina Destûr pêk dihat, da ku valahiyek di rêveberiyê de neyê çêkirin.

Duyem, bersiveke leşkerî ya lez û berfireh, bi armanca ku serkeftina destpêkê ya dijmin nebe biryarê siyasî ya dawî ango pêşî li ferzkirina rewşek "biryardar" ji êrîşa yekem ve were girtin.

Sêyem, rêvebirina asta zêdebûna şer, bi awayekî ku bersiva Îranê lêçûna şer li ser dijmin zêde bike, lê ne bi awayekî ku bibe sedema şerekî herêmî yê berfireh ku dibe sedema hevbendîyeke navdewletî ya li dij Tehranê(8).

Tevî ku Washington û Til Ebîbê armancên xwe ji êrîşa hevbeş a ji nişkeve eşkere kirin — tunekirina bernameya nukleerî û lawazkirina şiyanên mûşekî yên Îranê—, lê di heman demê de, serokê Amerîkayê Donald Trump û serokwezîrê Îsraîlê Benyamin Netanyahu bang li gelê Îranê kirin ku li dij rêjîma Îslamî rabin. Herduyan anîn ziman ku divê gelê Îranê, neteweyên cuda, hêz û partiyên opozîsyonê ji kuştina Xamineyî û êrîşên berdewam ên amerîkî–îsraîlî wekî derfetekê bikar bînin da ku li ser erdê bikevin tevgerê û rêjîma Îranê hilweşînin.

Diyar bû ku êrîşa hewayî ya li ser cihê civîna Xamineyî û lîderên bi wî re, ne tenê ji bo kuştina wan bû, lê herwiha armanc ew bû ku di nava rêjîma Îranê de asteke mezin ji tevlihevî û ne aramî çêbike û bingehên rêjîmê lawaz bike. Bi vê yekê re, derfetekê ji bo opozîsyona Îranê û partiyên çekdar were afirandin, da ku li dij rêjîmê rabin, baregeh û xalên leşkerî hedef bigirin û kontrola hin herêmên cografî bigirin. Herwiha, sazî û daîreyên dewletê li wan herêman bên destgirtin û ew dever wekî "herêmên rizgarkirî"ji desthilatdariya rêjîmê bêne ragihandin.

Trump jî xwe dispart vê senaryoyê û ji bo vê armancê bi kesayet û hêzên opozîsyona îranî re têkiliyên xwe zêde kirin, bi hêvîya ku li hundirê Îranê tevgerên li ser erdê destpê bibin û rêjîm ji hundir ve lawaz bibe û hilweşe.

Lê "Hevgirtina rêjîma Îranê piştî êrîşa yekem a Îsraîlê — ku di encamê de nêzîkî 40 kesayetên payebilind, di nav de jî Xamineyî, hatin kuştin — û bersiva lez û fireh a Îranê, ku tê de mûşekên balîstî û dron li dij Îsraîlê û baregehên amerîkî li Urdun û Başûrê Kurdistanê hatin bikaranîn, herwiha hedefgirtina binesazî û

navendên enerjîyê li dewletên Kendava Erebî, bi armanca zêdekirina lêçûna şer ji bo Amerîkayê û wê neçar bike ji bo şer rawestîne, ev bo Trump bû şokek mezin. Trump matmayî ma ku çima Îran radest nebû. Ji ber ku wî hêvî dikir senaryoyekî wekî ya Venezuela çêbibe, ku piştî girtina Nicolas Maduro, derfeteke lihevkirin û danûstandinê bi beşên mayî yên rêjîmê re çêbû"(9).

Îranê di bersivdana xwe ya li dij Amerîka û Îsraîlê de rêbaza kevneşopî ya ku hatibû texmînkirin bikar anî; ango barandina axa Îsraîlê bi mûşekên balîstî, mûşekên deng û dronan. Herwiha, baregehên amerîkî, berjewendî û navendên girêdayî Washingtonê li herêmê û navendên enerjî û cihên stratejîk li dewletên Kendava Erebî jî hatin hedefgirtin.

Rêjîma Îranê bi hezaran mûşek û dron ber bi dewletên Kendavê ve avêtin, bi armanca rawestandina aborî û jiyana asayî û afirandina rewşeke alozî û ne ewlehiyê, da ku van dewletan neçar bikin fişarê li Amerîkayê bikin ku şer rawestîne. Herwiha, armanc ew bû ku ev dewlet daxwaza Amerîkayê ya veguhastina baregehên wan bo leşkerên amerîkî — ku dibe di operasyoneke bejahî ya li dij Îranê de beşdar bibin — red kirin.

Lê çeka herî girîng ku Tehranê vê carê bi wê ket nav şer, girtina Tengava Hurmuzê bû. Bi vê gavê re, rêyên keştiyên bazirganî li pêş nêzîkî ji sedî 17 ji petrola ku diçe bazarên cîhanê û nêzîkî ji sedî 20 ê hilberîna gazê şil hatin girtin. Ev gav bandoreke giran li ser aboriya cîhanê kir û gelek dewletan bang li Washingtonê kirin ku şer bidawî bike û vegere maseya danûstandinan.

Di heman demê de, Trump gef li Tehranê xwar ku wê hêzên bejahî bişîne da ku girava Xergê — ku navenda pîşesaziya petrolê ya Îranê tê hesibandin — dagir bike. Herwiha, bang li dewletên cîhanê kir ku koalîsyoneke navdewletî ava bikin da ku li dij Îranê rawestin û Tengava Hurmuzê bi hêzê veke.

Derbarê hevalbend û şaxên Îranê li herêmê de, dîyar bû ku Tehranê vê carê milîs û komên çekdar ên girêdayî xwe bi heman hêz û bandora ku di şerê 12 rojan ê hizêrana 2025an de bikar anîbû, nexistin tevgerê. Ji bilî Huzbullahê li Lubnanê û pevçûnên ku di navbera wê û Îsraîlê de rû dan, herwiha êrîşên hin milîsên iraqî bi dronan li ser berjewendîyên Amerîkayê li Iraqê û li ser hin dewletên Kendavê, beşdariyeke fireh û çalak di şerê niha de ji aliyê hêzên girêdayî Îranê ve nehat dîtin.

Ev yek ji bo Hûsiyên Yemenê jî derbasdar bû, ji ber ku wan vê carê ne mûşek û ne dron ber bi Îsraîlê an baregeh û keştiyên leşkerî yên Amerîkayê ve neavêtin.

Bi berdewamîya derbeyan di nava mehekê de, şiyana Îranê ya birêvebirina torên xwe yên herêmî wekî berê lawaztir bû, ji ber fişara leşkerî ya rasterast li ser navendên rêveberî, fînansekirin û peywendiyê. Lê ev pêşketin ne tê  wateyê ku Îranê alav û şaxên xwe yên herêmî ji dest daye, belkî tenê şiyana wê ya bikaranîna wan bi awayekî hevdem û fireh sînordar bû.

Diyar bû ku bersivdayîn di navbera qada Lubnanê, Iraqê û Yemenê de bi demên cuda pêk dihat. Wekî mînak, bersiva Hûsiyan piştî meha yekem hat û ew jî sînordar û ne berdewam bû. Herwiha, aktîfbûna Huzbullahê jî sînordar ma û ne bi awayekî hevdemî bû. Di heman demê de, beşdariya hêzên Heşd Şebî li Iraqê jî nebû eniyeke vekirî ya şer.

Ev yek nîşan dide ku Îran di rêvebirina alavên xwe yên herêmê de lawaz bûye, ev yek jî asta bersivdayînê sînordar bû, lê ne tê wateya ku Îranê şiyanê giştî ji dest daye.

Bi vî awayî, dikare were hesibandin ku Washington û Tilebîb di kêmkirina qada manevraya Îranê de serkeftî bûne, her çend ew nekarîn van toran bi tevahî ji hev veqetînin jî. Wekî din, şer Îran ji cîranên xwe yên Kendavê veqetandiye, piştî ku di salên dawî de karîbû tecrîda xwe bişkîne. Têkiliyên bi welatên Kendavê re piştî êrîşên neheq ên Îranê li ser wan vegeriyane rewşek krîzê.

## Sêyemîn: Danûstandin û hewldanên bidawîkirina şer:

Di destpêka êrîşê de, serokê Amerîkayê Donald Trump ragihand ku şer zêdetirî çend rojan dirêj nabe û eger dirêj bibe jî, zêdetirî hefteyekê nabe. Lê piştre got ku dibe ku şer ji çar heta pênc hefteyan bidome. Dûv re jî careke din ragihand ku Amerîka dikare şer berdewam bike heta ku hemû armancên xwe pêk bîne. herwiha got ku Îran gefek mezin li ser ewlekarîya Amerîkayê bû û şanda îranî di danûstandinên dawî de xapandin kir û pêkanîna daxwazên Amerîkayê dereng xist, lewra şer bû neçarî.

Ji aliyê din ve, wezîrê karên derve yê Amerîkayê Mark Rubio di 2ê Adara 2026an de got: "Êrîşên ku Îsraîlê plan kiribûn li dij Îranê û bersiva texmînkirî ya Îranê li dij hêzên Amerîkayê, bûn sedem ku Amerîka di destpêka hefteyê de êrîşên xwe li dij Tehranê destpê bike".

Rubio herwiha ji rojnamevanan re got: "Me dizanibû ku Îsraîl dê operasyoneke leşkerî pêk bîne û me dizanibû ku ev yek dê bibe sedema êrîşan li dij hêzên Amerîkayê. Herwiha me dizanibû ku eger em berî wan, êrîşan dest pê nekin, em ê zirareke mezintir bibînin (11)".

Serokê Amerîkayê Trump, ku gef xwaribû eger rêjîma Îranê girtina Tengava Hurmuzê li pêşiya keştiyên navdewletî berdewam bike, wê stasyonên enerjî û pîşesaziyên petrolê yên Îranê hedef bigire û hilweşîne, paşê ji van gefan paşve kişiya. Trump di destpêkê de ji Tehranê re 48 saetan dem danibû ku Tengava Hurmuzê veke, paşê jî ev dem kir pênc roj.

Di 23ê adara 2026an de, Trump ragihand ku Amerîka bi Îranê re danûstandin kirine û gihiştine lihevkirineke destpêkê ya ji 15 xalan pêk tê. Trump got herdu aliyan li ser avêtina gavên hevbeş ji bo rêvebirina Tengava Hurmuzê li hev kirine.

Lê aliyê Îranê gihiştina her cure lihevkirinê bi Washingtonê re înkar kir. Serokê parlamentoya Îranê, Mihemed Baqir Qalîbaf jî ragihand ku Tehranê tu danûstandin bi Witkoff û Kushner re nekiriye.

Dîyar dibû ku rêveberiya Amerîkayê gihiştibû wê baweriyê ku şer û bombebarana yekser a li dij baregehên leşkerî, navendên ewlekariyê û lojîstîkê, rûxandina rê û piran, herwiha kuştina fermandarên leşkerî û siyasî yên Îranê, nekaribû û nikare bibe sedema hilweşîna rêjîmê, radestbûna wê, an jî derketina serhildanên mezin ku bibin sedema rûxandina wê.

Herwiha eşkere ye ku "aliyên ereb û yên din ên navneteweyî Trump ji xetereyên her bombebarankirina avahiyên petrolê û santralên elektrîkê û zirara wêranker a ku dê li ser jîngehê çêbike agahdar kirin. Wiha xuya dike ku aliyek herêmî kariye kanalek nû ya ragihandinê bi serokatiya Îranê re veke piştî ku Îsraîlê di 17ê adara 2016an de serokê Encumena Ewlekariya Neteweyî ya Îranê, Elî Larîcanî, ku wekî aliyek potansiyel di her danûstandinên rawestandina şer de dihat dîtin, ku tê dîtin. Dema ku Trump di 21ê adarê de gefa xwe da ku di nav 48 saetan de li santralên elektrîkê yên Îranê bixe ger Tengava Hormuzê neyê vekirin, ew ji hebûna kanalek ragihandinê hate agahdarkirin ku dikare bibe sedema danûstandinan bi Îranê re, ku ev yek wî teşwîq kir ku vê demê pênc rojên din dirêj bike. Pakistanê, piştî têkiliyên ku bi Washington û Tehranê re çêkir, pêşniyar kir ku mazûvaniya danûstandinên asta bilind ên amerîkayî-îranî

bike. Qeter, Oman, Tirkiya, Fransa û Brîtanya jî bi rêyên veşartî ketin nav danûstandinan da ku her du aliyan teşwîq bikin ku danûstandinan bikin, ku xuya ye Washington qebûl kiriye."[1]

Herwiha sedemên din jî hene ku çima Trump çareseriyek dîplomatîk tercîh kir ji ber bandorên din ên şer û îhtîmalên vekirî yên gurrbûnê, di nav de xwesteka wî ya aramkirina bazaran û kontrolkirina bihayên petrolê, ku ji şer ve du qat zêde bûne. Rêveberiya Amerîkayê bi derxistina biryarekê di 20ê adarê de, gavek avêtibû da ku bazarên cîhanî aram bike û hewl bide hêrsa navneteweyî kontrol bike, bi armanca ku petrola xav a Îranê ya ku bi tankeran tê veguhastin ji bo 30 rojan ji cezayan bêpar bihêle, bi armanca ku ew bigihîne bazarên cîhanî û bi vî rengî hewl bide ku bandorên girtina Tengava Hormuzê û krîza ku wê di bazarên enerjiyê yên cîhanî de çêkiriye kêm bike.

Di 8ê nîsana 2026an de, Serokê Amerîkayê Donald Trump rêkeftineke agirbestê ya du hefteyan bi Îranê re ragihand û ev yek bi vekirina tevahî ya Tengava Hurmuzê ji aliyê Îranê ve girê da. Di 11 û 12ê nîsanê de, gera yekem a danûstandinan di navbera Amerîka û Îranê de ji destpêka şer û pevçûnan di 28ê sibata 2026an de li Îslamabada Pakistanê pêk hat. Şanda Îranê ji Serokê Parlamentoyê Mihemed Baxer Xalîbaf, Wezîrê Derve Abbas Eraqçî, Sekreterê Konseya Bilind a Ewlehiya Neteweyî Mihemed Baxer Zolghadr, Sekreterê Konseya Parastinê Elî Ekber Ehmedî û Serokê Banka Navendî Ebdulnasir Hemmatî û herwiha parlamenter û berpirsên din ên leşkerî pêk dihat. Şanda Amerîkayê ji Cîgirê Serok J.D. Vance û nûner Steve Wittkopf û Jared Kushner pêk dihat. Danûstandin bê encam bi dawî bûn û dikare were gotin ku vê gera danûstandinan "sê astên bêçalakiyê eşkere kir. A yekem bêçalakiya têgihî ye, ji ber ku Washington û Tehran di pênasekirina têgiha 'aştiyê' de ji hev cuda ne. Her çiqas Amerîka aştiyê wekî rewşek kontrolkirina tevahî li ser tevgera Îranê, nemaze di warên navokî û herêmî de dibîne jî, Îran bawer dike ku aştî divê li ser bingeha naskirina rola wê wekî hêzek herêmî ya serwer be, ne wekî aktorek ku were kontrolkirin an jî were têkbirin. Ev cudahî nakokiyek di navbera du modelan de nîşan dide: Modela hegemonya ewlehiyê û modela serxwebûna

[1] ـ ترمب والمفاوضات مع إيران: بحث عن مخرج من الحرب أم خداع جديد؟. المركز العربي للأبحاث ودراسة السياسات. الدوحة، قطر. تاريخ النشر: 26 مارس/ آذار 2026. الرابط:
https://www.dohainstitute.org/ar/PoliticalStudies/Pages/exit-strategy-or-bluff-trumps-negotiations-with-iran.aspx

stratejîk a Îranê. Ya duyemîn jî bêçarebûna avahîsaziyê ye ku bi nebûna baweriyê ve girêdayî ye, ku berhema kombûna dîrokî ya peymanên hilweşiyayî û ezmûnên têkçûyî ye, bi taybetî bandorên vekişîna Amerîkayê ji peymana navokî ya 2015an di dema rêveberiya yekem a Donald Trump de. Vê vekişînê baweriya di nav elîtên îranî de xurt kir ku her peymanek bi Washingtonê re nazik dimîne û dibe ku bi guhertinên di rêveberiyan de hilweşe, ku ev yek tawîzên stratejîk dike mijarek pir biha ya siyasî".[2]

Hejmarek pirsgirêkên bingehîn bûn sedema têkçûna gihaştina rêkeftineke dawî û beşdarî çêbûna rewşa bêçare ya heyî bûn, di nav de "israra Amerîkayê li ser rêkeftinên ku di bingeha bernameya nukleri ya Îranê de ne, nemaze di derbarê dewlemendkirin û depoya uranyûmê de û herwiha daxwazên têkildarî Tengava Hormuzê û rola wê di hevkêşeya astengkirin û zexta hevbeş de. Ji bo Îranê, ev dosya ne mijarên danûstandinê yên teknîkî ne ku dikarin ji serweriya neteweyî werin veqetandin, lê belê ew di dilê pênasekirina statuya wê ya herêmî û şiyana wê ya parastina berjewendiyên xwe de ne. Ji ber vê yekê, ji bo Tehranê dijwar xuya bû ku bersivê bide daxwazên bi vî rengî, ne tenê ji bo berçavgirtina danûstandinan lê di heman demê de ji ber ku qebûlkirina wan dibe ku di hundur û herêmî de wekî tawîzek stratejîk were fêmkirin ku ji sînorên çareseriyek demkî derbas dibe".[3]

Roja din, 13ê nîsana 2026an, di bersiva têkçûna danûstandinên Îslamabadê de, Trump ragihand ku Washington dê dest bi dorpêçkirina deryayî li ser Tengava Hurmuzê bike û gefa xwe ya wêrankirina binesaziya enerjiyê ya Îranê dubare kir heya ku rêkeftinek ji bo bidawîkirina dawî ya şerê li Rojhilata Navîn neyê çêkirin. Trump ji Fox News re got, "Ez dikarim di rojekê de Îranê ji holê rakim... Ez dikarim her tiştê ku enerjiya wan heye, hemî santralên wan ên elektrîkê ji holê rakim." Berî vê yekê, Trump di postek li ser platforma xwe ya Truth Social de îdia kiribû ku danûstandinên li Pakistanê baş çûne û piraniya xalan li hev kirine, lê wî destnîşan kir ku Tehran red kiriye ku di derbarê bernameya xwe ya nukleri de tawîzan bide. Wî zêde kir ku di bersivê de, Hêza Deryayî ya

[2] ـ عبد الله راشد المرسل: تحولات الأزمة الأميركية ـ الإيرانية بين انسداد أفق الدبلوماسية وهيمنة منطق القوة. مركز "الجزيرة" للدراسات. الدوحة، قطر. تاريخ النشر: 21 أبريل/ نيسان 2026. الرابط:
https://studies.aljazeera.net/ar/article/6505

[3] ـ فاطمة الصمادي: لماذا تعثرت مفاوضات "إسلام آباد"؟. مركز "الجزيرة" للدراسات. الدوحة، قطر. تاريخ النشر: 12 أبريل/ نيسان 2026. الرابط:
https://studies.aljazeera.net/ar/article/6496

Amerîkayê, ya herî baş a cîhanê, dê tavilê dest bi astengkirina her keştiyek ku hewl dide bikeve an ji Tengava Hurmuzê derkeve bike û her îraniyek ku guleyan li me an li keştiyên aştiyane bixe dê bişîne dojehê.[4]

